Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1313 | 5-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 3 cihên şûnwariyê...(8)

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê gundê Lêlên, Til Meşneqe û Mizgefta Mensûr e.**










### Gundê Lêlên

Gundê Lêlên bi 8 km dikeve bakurê navçeya Tirbespiyê. Gund bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Şûnwarên gir heta niha mane. Derdora 150 sal berê gund li rex girê dîrokî hatiye avakirin. Li gorî lêkolînên dîrokî ku behsa gundê Lêlên dikin, diyar dikin ku di wê demê de bajarek bû û navê wî Şexna bû. Di salên di navbera 2300`an heta 2200'an B.Z. de di bin serweriya Împarotariya Akadan de bû ku gelek navendên Akadî li herêma Xabûr ava kiribûn. Ji delîlên ku hebûna Akadan li vê herêmê îsbat dike, hatine vedîtin. Akadiyan bajarê nizm bi sûreke parastinê gelek mezin bi qalinbûna 8 metreyan ava kirin. Di dema Akadiyan de bajar ji aliyê çandiniyê û aboriyê ve geş bûbû. Akadiyan gelek avahiyên giştî wekî perestgeh ava kirin û ayînên baweriya Akadiyan lê pêk dianîn. Şandeya Amerîkayê ya ji Zanîngeha Yale bi rêveberiya Harvî Ways di sala 1979'an de ku li gir vekolîn kirine, hate diyarkirin ku dîroka gir vedigere serdema Hamûrrabî. Şandeya Amerîkayê di nivîsandina raporên xwe de ruqmên mixî û peykerên axî ku di vekolînan de dîtine, bingeh girtin. Xebatên vekolînê heta destpêka aloziya Sûriyê sala 2011'an berdewam kiribûn. Gundê Lêlên ji girîngtirîn cihên stratejîk ên serdemên kevn e. Her wiha di wê demê de cihekî bazirganiyê yê girîng bû û tê de depoyên genim hebûn. Şêniyên wê bi pirranî bazirganî dikirin. Heta niha jî şûnwarên depoyên genim lê hene.undê Lêlên bi 8 km dikeve bakurê navçeya Tirbespiyê. Gund bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Şûnwarên gir heta niha mane. Derdora 150 sal berê gund li rex girê dîrokî hatiye avakirin. Li gorî lêkolînên dîrokî ku behsa gundê Lêlên dikin, diyar dikin ku di wê demê de bajarek bû û navê wî Şexna bû. Di salên di navbera 2300`an heta 2200'an berî zayînê de di bin serweriya Împarotariya Akadan de bû ku gelek navendên Akadî li herêma Xabûr ava kiribûn. Ji delîlên ku hebûna Akadan li vê herêmê îsbat dike, hatine vedîtin. Akadiyan bajarê nizm bi sûreke parastinê gelek mezin bi qalinbûna 8 metreyan ava kirin. Di dema Akadiyan de bajar ji aliyê çandiniyê û aboriyê ve geş bûbû. Akadiyan gelek avahiyên giştî wekî perestgeh ava kirin û ayînên baweriya Akadiyan lê pêk dianîn.

Li gorî şandeya Amerîkayê ya ji Zanîngeha Yale bi rêveberiya Harvî Ways di sala 1979'an de ku li gir vekolîn kirine, hate diyarkirin ku dîroka gir vedigere serdema Hamûrrabî. Şandeya Amerîkayê di nivîsandina raporên xwe de ruqmên mixî û peykerên axî ku di vekolînan de dîtine, bingeh girtin. Xebatên vekolînê heta destpêka aloziya Sûriyê sala 2011'an berdewam kiribûn. Şandeyê di raporên xwe yên ku radestî hikumeta Sûriyê kiribûn de diyar kiribûn ku girê gundê Lêlên ji girîngtirîn cihên stratejîk ên serdemên kevn e. Herwiha di wê demê de cihekî bazirganiyê yê girîng bû û tê de depoyên genim hebûn. Şêniyên wê bi pirranî bazirganî dikirin. Heta niha jî şûnwarên depoyên genim lê hene.

### Til Meşneqe

Til Meşneqe li herêma Cizîrê li nêzî çemê Xabûr dikeve, ew yek ji cihên dîrokî yên girîng ên Mezopotamyayê ye. Ev cih bi gelemperî şarestaniyên kevn ên Mezopotamyayê ên di sedsalên 3 heya 4'an ên berî zayînê de dijiyan, diteyisîne. Lêkolînên arkeolojîk di nav salên 1980 û 1990'î de hatine kirin û gelek şûnwarên kevn wekî kûzên rengîn, muhr û neqşeyên dîrokî hatine dîtin. Di nav wan de, peykerên biçûk û serê lawiran hatine vedîtin, ew şûnwar jî reng û rêbazê civakên li wir jiyana xwe bi rêveberiya civakî û çandî pêk tanîn nîşan dide. Til Meşneqe cihekî xwedî taybetmendiyeke girînge di warê pêkanîna lêkolînên dîrokî de, ji ber ku ev cih nîşan dide ka çawa kûz, nivîs û şûnwarên kevin di Mezopotamyayê de hatine çêkirin û pêşxistin. Herwiha Til Meşneqe cihê stratejîk û bazirganiyê riyên kevin ên gelên Mezopotamyayê ya nîşan dide.

### Mizgefta Mensûr

Jê re Mizgefta Mensûr an Mizgefta Ebbasiyan jî tê gotin. Ev mizgeft li navenda bajarê Reqqayê yê îroyîn e. Girîngiya wê, tevî rewşa wê ya xirab a îroyîn, di wê rastiyê de ye ku ew yekane mînaka şêwaza fermî ya mizgeftên serdema Ebbasiyan li Sûriyê temsîl dike. Ev şêwaz bi girseyîbûna xwe û bi rastî jî ku rûyên wê yên derve ji hêla girseyîbûna xwe û bircên ku di nav wan de çar burc hene, şiklê kelehan digire, tê xuyakirin. Li gel bermahiyên koşkên Ebasiyan û bermahiyên dîwarê derve û deriyên wê avahiyên arkeolojîk li Parêzgeha Reqayê yên herî girîng in.

## Gotina Dawî



### Çima di nava Kurdan de dîwar hene?

Mihemed Seydi

Em carnan qala Kurdên çar parçeyên Kurdistanê dikin ku ka wê çawa bibin yek û sînorê di nava Kurdan de çawa bê rakirin û ew ji hev re zêdetir bibin pişt. Carnan jî dikevin nava xeyalên ku Statuyeke Kurdan a yek parçe hebe û ew bi nasnameya xwe ya Kurdî xwe bidin naskirin û bê ku bibêjin ew Kurd in, li ser nasname û passportên wan bê danîn ku ev mirov Kurd e. Ne weke ku li Rojava û Başûrê Kurdistanê mejbûrî rakirina nasnameyeke Erebî an jî li li Îranê Faris yan jî li Bakur Tirk be. Lê paşê şert û mercên Kurd di nav de ne difikirî û dibêjî; de wê rojekê Kurd jî bibin xwedî nasname.

Sîstemên dewletên ku welatê Kurdan di nava wan de hatiye parçekirin vê zilmê bi salaye dikin û heta roja îro jî ev hal dewam dike. Tevî ku li başûr Statuya Kurdan heye û li Rojava Kurd xwedî rêveberî ne, lê heta roja Îro jî zêde tişt neguheriye. Lê dîsa jî Kurd hêviya xwe bi yekparbûna Kurdan ve girêdidin. Yekparçebûna welatê ku di nava sînorên dewletan de maye, hêviya Kurdan e û ji bo vê jî her banga yekîtiyê tê kirin. Bakur dayike ji bo Rojava û birayê bi çûk ê Başûr e û hêviye ji Rojhilat re da Kurd bibin xwedî hêzeke naskirî ya hevgirtî.

Me dît ku di rojên wek îro de, di sala 2014'an de, çawa ciwanên Kurd ji parçeyên Kurdistanê berê xwe dan bajarê Kobanê da şerê Daiş bikin. Ev şer ji bo nasnameya Kurdan, şerê hebûn û nebûnê bû. Di vî şerî de li her derê her kesî got; eferim ji Kurdan re.

Dîsa di demekê de ye ku Kurd sînorên di nava welatê wan de bi destê zordaran hatiye lêkirin derbas dikin, li nava Rojava û Başûrê Kurdistanê de, dîwar tê lêkirin.

Berî çend rojan bû nûçeyên bi dîmen hatin belavkirin ku dîwar di nava van herdû parçeyên Kurdistanê de tê lêkirin. Ji xwe di nava Bakur û Rojava de dewleta Tirk ava kiriye û di nava Şengalê û Rojava de Îraqê ava kiriye lê vî dîwarî kî ava dike? Çima ev dîwar tê lêkirin ku di demekê de ye hêviya rakirina sînorên berê tê kirin?

Ger Kurd bi xwe hev bi van dîwar û sînoran bi çûk bikin, ew ê çawa ji derve re bibêjin em miletekî xwedî yek Welatin lê bi van dewletên heyî di nava Kurdistanê de sînor hatine danîn?

Dixwazim di gotina xwe ya dawiyê de bibêjim, yê qale Kurdistanê û parastina Kurdan bike, nabe ku dîwaran ava bike û zextê li Kurdên parçeyekî din bike. Çi Bakur, çi Rojhilat, çi Başûr û çi jî Rojava, nabe deriyan li ser hev bigrin ku di demekê de Kurd qale nasnameya Kurdistanê dikin. Yê dîwaran lê bike, ew e ku li dijî nasnameya Kurdan dijminatiyê dike.

### Sudoku:Pirs 60

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 7 | | | 2 | | |
| 7 | 1 | 6 | | 5 | 8 | | | |
| 9 | 8 | | | 3 | | | | |
| | 5 | 8 | | 4 | | 6 | | |
| 1 | | | | | | | | 3 |
| | | 4 | | 9 | | 5 | 1 | |
| | | | | 7 | | | 5 | 2 |
| | | | 9 | 2 | | 1 | 3 | 7 |
| | | 9 | | | 3 | | | |

### Sudoku: Bersiv 59

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | 3 | 8 | 1 | 4 | 6 | 2 | 5 |
| 8 | 6 | 4 | 5 | 2 | 3 | 7 | 9 | 1 |
| 1 | 2 | 5 | 7 | 6 | 9 | 4 | 3 | 8 |
| 4 | 8 | 6 | 3 | 9 | 1 | 5 | 7 | 2 |
| 3 | 5 | 7 | 2 | 8 | 6 | 1 | 4 | 9 |
| 2 | 1 | 9 | 4 | 7 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 4 | 8 | 2 | 5 | 7 |
| 9 | 4 | 2 | 6 | 5 | 7 | 8 | 1 | 3 |
| 5 | 7 | 8 | 1 | 3 | 2 | 9 | 6 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Lingên xwe xistine zikê xwe:**
- Pir birçî ye; tiştekî ku bixwe nîne; rewşa wî ya aborî pir xirab e.

**Qurequra zikê min e:**
- Ez pir birçî me.

**Tu dibêjî qey ji xelayê ve hatiye:**
- Dema yek ji bo xwarinê pir lezê dike hingê jê re tê gotin.

**Xela lê rabûye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER DIJBERIYÊ**

**Avêtiyê:**
- Li dijî wî axivî.

**Avêtin hev:**
- Li dijî hev axivîn.

**Berê xwe dayê:**
- Li hemberî wî rabû; li hemberî wî serî rakir; êrîş kirê.

**Berên xwe dan hev:**
- Navbera wan ne xweş bû; bûn neyarên hev.

**Bi sihika tifingê li hev dinêrin:**
- Pir ji hev aciz in; dijminên hev in; pir ji hev hêrs bûne.

**Bizmara wî xist avê:**
- Davik jê re vedan.

**Bûye gurê di derê mizgeftê re baz dayî:**
- Her kes êrîş dikiyê.

Ceynika min jê diêşe
- Ez pir jê aciz im.

**Ceynika min jê diare:**
- Bi heman wateyê.

**Çavreşî dayê:**
- Li ber çavê wî reş bû.

**Çavreşî avêtiyê:**
- Bi heman wateyê.

**Dahola wî zêde nekute:**
- Li dijî wî neaxive; neavêjiyê.
(Dema yek li dijî yekî ne amade diaxive, hingê jê re tê gotin)

**Daye ber koka didanê xwe:**
- Dijminiya wî dike; li hemberî wî pir bikîn e.

**Dev avêtê/dev avêtiyê:**
- Gotinên nebaş derbarê wî de gotin; li dijî wî axivî.

**Dev dan hev:**
- Gotinên nebaş ji hev re gotin; dengê xwe li hemberî hev bilind kirin; bi hev çûn.

**Devê wî lê vebûye:**
- Derbarê wî de diaxive; li dijî wî diaxive; dev diavêjiyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

---




## Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên dîtbarî

Ji berhemên Ragihandina Azad ku piştî xebatên nivîskî rastiya şoreşê raxistin ber çavan, bûn hêz, rû û dengê gelan; Ronahî TV, Rojava TV û Jin TV.**R-3**

## 'Peymana 9'ê Cotmehê plana dewamkirina fermana civaka Êzidî bû'



Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Cîhan Celo da zanîn ku Cotmeh meha komployan e, peymana Şengalê jî komployek bû ji bo temamkirina fermana civaka Êzidî bû û got, "Em encax dikarin bi fikrê Neteweya Demokratîk hemû komployan vala derxin."**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1313 | 5-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## 'Îsal lêçûna çandiniya pembû pir zêde bû û nirxê kirînê kêm e'



Cotkarê zeviyê pembû yê bi navê Ebdulkerîm Mihemed diyar kir ku îsal mesrefa çandiniya pembû pir zêde bû û nirxê kirînê kêm bû, ji ber wê cotkaran ziyaneke mezin dîtin.**R-6**

# 'YPJ'Ê MISOGERIYA AZADIYA JIN Û CIVAKÊ YE'

Endama Konseya Leşkerî ya Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Kurdistan Koçer diyar kir ku bêyî parastin tu civak nikare li ser piyan bisekine, parastin bi qasî nan, av û hewaya paqij ji mirovan re pêwîst e. Kurdistan Koçer da xuyakirin ku dijmin çiqas gef û êrişên dagirkeriyê zêde bike, ew ê jî bersiva van êrişan bidin û got, "Jin, YPJ'ê weke hebûn û misogeriya azadiya xwe pênase dikin."**R-2**



## 'Muzîk ji bo min jiyan e'




Ciwana Kurd Siyan Nebo bi dengê xwe yê xweş ê mîna sira bayê çiyayê Kurmênc mîrateya bajarê Efrînê nûjen dike û diparêze. Siyan Nebo dibêje, "Muzîk û stranbêjî ji bo min jiyan e".**R-7**

## Ahmed Pelda: Têkiliyeke xurt a civakî û aborî ya Kurdên Ewropayê nîne



Aborînas û lêkolîner Ahmed Pelda diyar kir ku li Ewropayê ji hemû deverên Kurdistanê bi milyonan Kurd kom bûne, lê têkiliyeke wan ya civakî û aborî ya xurt nîne, tenê çalakiyên siyasî û pîrozbahiyên çandî wan tîne gel hev, lê sazî û dezgehên ku hemû Kurdan bighîne hev, hevkariya siyasî, çandî û aborî xurt bike, nîne.**R-4**



**Beşera Pêvajoyê!**
Ahmet Aktaş R-4



**Du sêyên salê ji yekdestariya HTŞ vediguherin bêbawerî û komkujî**
Idrîs Henan R-5



**Giraniya gotinê**
Remezan Olçen R-7

# Arîn Mîrkan; Efsûneya serkeftina vîn û îradeyê ye

**Di 5'ê Cotmeha sala 2015'an de têkoşera Kurd Arîn Mîrkan bi vîneke xurt, ji bo parastina heval û bajarê Kobanê çalakiyeke fedayî pêk anî. Arîn Mîrkan bi vê çalakiya xwe ya fedayî bû meşeleya berxwedanê û rêya azadiya jinan nexşe kir.**

Dîlan Mulhim\Qamişlo

Di dirêjahiya dîrokê de, bi hezaran jinên têkoşer û berxwedêr hene ku mohre xwe li dîrokê dane û di warê hişmendî, civakî û rêxistinî de şoreş ava kirine. Herwiha dikaribûn bibin xwedî mîrate û rolên girîng bigrin ser milê xwe. Gelê Kurd ku bi berxwedanî û qehremaniya xwe tê naskirin, jinan di gelek serdeman de pêşengî ji civaka xwe re kirine û bûne bingeha serkeftinê ji wan jinan Arîn Mîrkan û Rêvana Rojava û bi sedan jinên ku di dem û cihên cuda de bûne pêşengê serhildan û şoreşê.

### Kurtejiyana têkoşera berxwedêr 'Arîn Mîrkan'

Arîn Mîrkan bi navê xwe yê rast Dilara Kînc. Arîn di sala 1992'yan de, li gundê Mîrkan ango Hisê yê girêdayî navçeya Mabeta ya Efrînê ji dayik bûye. Dibistana xwe ya seretayî û navîn li gundê Mîrkan xwendiye. Arîn mîna Zîlan û Bêrîtan Keça malbateke welatparêz e. Di heman demê de, xwedî têgihiştineke rastiya Kurd û Kurdistanê bû. Lewra têkoşera bêhempa Arîn Mîrkan a ku bûye navnîşana berxwedana Kobanê, hîn di temenê xwe yê biçûk de ku di sala 2007'an de tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe. Arîn Mîrkan di nava hevalên xwe de bi rûkenî, dilnizmî û fedekarî dihat nasîn.

Bi Şoreşa Rojava re di sala 2012'an de û avabûna YPJ`ê di Nîsana 2013'an de, Arîn Mîrkan derbasî Rojavayê Kurdistanê dibe û cihê xwe di nava YPJ'ê de digre. Di heman demê de, Arîn xwedî sekin û kesayeteke bi coş û moral bû. Herwiha di nava YPJ'ê de bi rengekî xwezayî rola fermandariyê dilîst û ji bona hevalên xwe çavkaniya hêvî û coşê bû. Arîn tevî sê birayên xwe beşdarî nava refên berxwedanê dibin û xwesteka wê jî ew bû ku her tim li hemberî dijmin di qada cengê de şer bike, lê dijmin nedizanî ku wê Arîn bi çalakiya xwe fedayî di dilê dijmin de wekî volkanekî xwe biteqîne. Ev jiyana lehenga keça Kurd e, ev ne efsaneyeke ji xeyalê mirove, ev Arîn e, nasnameya kurd û Kurdistanê ye.

### Çalakiya fedayî

Di 15'ê Îlona 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê ji 3'ê aliyan ve bi êrîşeke dijwar berê xwe dane Kobanê. Ji bo parastina Kobanê şervanên YPJ'ê, YPG'ê û gelê welatparêz li dijî êrîşan li ber xwe dan. Di 5'ê Cotmehê de êrîşên çeteyan gihiştin Girê Miştenûr, ji ber Miştenûr cihekî stratejîk bû, çete bi hemû hêza xwe êrîş kirin. Di wê navberê de têkoşer Arîn Mîrkan bi cesaret û vîneke xurt, ji bo parastina hevalên xwe û Kobanê çalakiya fedayî pêk anî. Bi vê çalakiyê re asta berxwedan û têkoşîna şervanên YPJ'ê digihîje lûtkeyê. Ev berxwedan û têkoşîn bi rizgarkirina Kobanê di 26'ê Çileya 2015'an de tacîdar dibe û YPJ'ê weke nasnameya tevahî jinên azadîxwaz hat pênasekirin. 5'ê Cotmehê salvegera 11'emîn a operasyona Tevgera Azadiyê ya şervanên Yekîneyên Parastina Jin, Arîn Mîrkan e ku di berxwedana Kobanê de li hember êrîşên çeteyên DAIŞ'ê pêk anî.

### Arîn Mîrkan sembol û efsaneya berxwedana Kobanê ye

Arîn Mîrkan bi fedekartiya ku bûye sedem kîna di hundir her şervanekî/ê de xurt bibe û hêza DAIŞ'ê têk bibin, weke nasnameya tevahî jinên azadîxwaz hat pênasekirin. Çalakiya Arîn Mîrkan, derbeyeke mezin li çeteyê DAIŞ'ê xist. Piştî vê çalakiya fedayî ya birêz Arîn Mîrkan, êdî berxwedana Kobanê ket qonaxeke nû û bi sedan Arînên din, bedena xwe di dijmin de teqandin. Arîn bi vê çalakiya xwe ne tenê weke keça Efrînê tê dîtin, di dilê her kobaniyekî/ê de û her kurdistaniyekî de bû mîras û nasnameya serkeftina rêhevalên wê li hember DAIŞ'ê. Berxwedana dîrokî û efsûnewî a gel û bajarê Kobanê, bi serkeftina rizgarkirina wê re tacîdar bû. Berxwedana Kobanê di cîhanê de deng veda û ji aliyê dewletên cîhanî ve rojeke taybet jê re hat veqetandin.

### Arîn Mîrkan pêşenga şoreşa jinan e

Bi artêşbûn û rêxistinbûna jinên Kurd re rewşa jinên Kurd jî ber bi guhertinê ve çû. Jinên Kurd xwe li ser bingeha felsefeya Jin, jiyan, azadî birêxistin kirin û bîrdoziya rizgariya jinan ji bo na xwe kirin armanc. Perspektîfên Rêber Abdullah Ocalan a xwe dispêre felsefeya "jin, jiyan, azadî" ji bo jinên Kurd vejîneke nû bû ku bi saya vê yekê dikaribûn di tevahî qadên jiyanê de bibin xwedî hebûn û misyon. Herwiha rêxistinên xwe yên



xweser weke partî, artêş, yekîne, tevger, yekîtî, zanist û hwd, ava kirin. Di nava van destkeftiyan de jinên Kurd bi çalakiyên xwe yên fedayî jî hatin naskirin. Ev jinên ji çar perçeyên Kurdistanê weke Bermal, Şaristan Cizîr, Rewşen, Zîlan, Rêvan Kobanê, Arîn Mîrkan, Avêsta Xabûr û Rûken Zelal bi felsefeya jin, jiyan, azadî bawer kirin û ji bo şoreşa jinan canê xwe feda kirin. Di heman demê de, Arîn Mîrkan ji tevahî cîhanê re, di dema mijar girêdayî azadî û doza wê de be, tekez kir ku vîn û hêza jina Kurd heye. Bi wê re jî bi sedan têkoşerên mîna Avêsta Xabûr, Barîn Kobanê yên bûne sembol ji tevahî jinên cîhanê re li ser rê û fikra wê meşîn.

# 'YPJ'ê hebûn û misogeriya azadiya jinan e'

Birûc Resûl/Hesekê

**Endama Konseya Leşkerî ya Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Kurdistan Koçer diyar kir ku dijmin çiqas gef û êrişên dagirkeriyê zêde bike ew ê jî bersiva van êrişan bidin û got, "Jin; YPJ'ê weke hebûn û misogeriya azadiya xwe pênase dikin."**

Di 25'ê Îlonê de li bajarê Hesekê konferansa 4'emîn a Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Jin hat lidarxistin. Bi armanca ku di vê pêvajoya nû de çawa her jinek keribe parastina xwe û ya civakê bike. Di konferansê de jin û girîngiya parastinê bi awayekî berfereh hat nîqaşkirin û nerxandin, her wiha ji dîrokê heta roja îro jinên têkoşer, berxwedêr û afrîner, her dem rastî tundî û zordariyê hatine. Jinên têkoşer, bi çirûska 19'ê Tîrmehê re dikarîbûn rabin ser piyan û hebûn û nasnameya xwe biparêzin. Di vê çarçoveyê de Endama Konseya Leşkerî ya



Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Kurdistan Koçer ji Rojnemeya me re axivî.

### 'YPJ'ê ne tenê hêzêke leşkerî ye'

Kurdistan Koçer di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: "Bi şoreşa jinan re jin dikarîbûn xwebûn, nasname, hebûn û vîna xwe ava bikin û biparêzin. Ger jin pergal û şoreşa xwe neparêzin wê bi hêsanî têk biçin û rastî êrişên tunderew werin lewra ji bo ku destkeftiyên jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê werin parastin, hêzên jinan hatin avakirin, yek ji wan jî Yekîneyên Parastina jin e. YPJ'ê ne tenê hêzêke leşkerî ye, di heman demê de hêzeke bîrdozî ye. Bêyî parastinê tu civak nikare li ser piyan bisekine, parastin bi qasî nan, av û hewaya paqij ji mirovan re pêwîst e. Me 13 salên têkoşînê li pişt xwe hiştin. Em bi saya keda ewqas hevrêyên me yên şehîd û hevrêyên ku niha di çeperên şer de li ber xwe didin, gihîştin van rojan. Ji ber vê ji vir û pê de em bi ti awayî nikarin înkarkirina jinê û hebûna jinan a di qadên têkoşînê de qebûl bikin. li ser vê bingehê ku em niha di konferansa 4'emîn a Hêzên Ewlekariya Hundirîn kom bûne da ku em xalên parastin, têkoşîn û berxwedana jinan nîqaşan bikin."

### 'Li hemberî hemû gef û êrişên dagirkeriyê bêdeng namînin'

Kurdistan diyar kir ku jin di şoreşê de bi fedakartiyeke mezin tevlî bû û wiha domand: "Jin di Şoreşa Rojava de fedakartiyeke mezin da û ev şoreş bi felsefeya Jin, Jiyan, Azadî reng û dengê xwe da tevahî cîhanê. Jinan bi parastina xwe ev maf bi dest xistin. Yekîneyên Parastina Jin li dijî çeteyên DAIŞ'ê serkeftinên pir mezin bi dest xist. Jin ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, lê belê li hemû herêman rastî tundiyê tên, ji bo pêşîgirtina vê tundiyê û gefan parastina jinan pir girîng e.

Em di pergalekî wisa de ne ku deng û rengê jinê tuneye. Li ser vê bingehê me bi têkoşîn û parastinê; Xwe û tevhaî jinan anîn vê astê. Ji vir û pê de jî têkoşîn, israr û biryara me ji bo parastina jinan û axê, wê heman tişt be. Ji wiha zêdetir em ê bikaribin xizmeta hemû jinan, parastina gelan bikin ku li ser piyan bimînin. Bê guman em li hember hemû gef û êrişên dagirkeriyê bêdeng namînin, emê heta dawiyê li ber xwe bidin. Dijmin çiqas gef û êrişên dagirkeriyê zêde bike, em ê jî wek şervanên YPJ'ê bersiva van êrişan bidin."

### 'YPJ'ê hebûn û misogeriya hebûna jinan e'

Endama Konseya Leşkerî ya YPJ'ê Kurdistan Koçer di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku gelek jin hebûna YPJ'ê wek hebûn û misogeriya hebûna xwe pênase dikin û wiha pê de çû: "Dijminê me dijminekî hov e û divê em xwe biparêzin. Di heman demê de hêza xwe xurt bikin û baweriya xwe mezin bikin. Bila piştgiriyê bidin Hêzên Parastina Jinan (YPJ) ji bo ku em karibin parastina xaka xwe bikin. Ev erkek wijdanî ye, berpirsyartiya wê li ser milê her jinekê ye. Li kêleka vê yekê jî gelek jinan hebûna YPJ'ê wek hebûn û misogeriya azadiya xwe pênase dikin. Ji ber vê em ê heya dawî parastina tevahî jinan bikin, em ê bibin bersiv ji tevahî kesên ku jin di nava xwe de qebûl nakin re."



# 'Muzîk ji bo min jiyan e'

**Ciwana Kurd Siyan Nebo bi dengê xwe yê xweş ê mîna sira bayê çiyayê Kurmênc mîrateya bajarê Efrînê nûjen dike û diparêze. Siyan Nebo dibêje, "Muzîk û stranbêjî ji bo min jiyan e".**

Navenda Nûçeyan

Di nava zorî û zehmetiyan de gelek çîrokên balkêş tên jiyîn. Tevî koçberiyê û dîtina gelek êş û azaran jineke ciwan a Efrînî bi dengê xwe yê xweş mîrateya bajarê Efrînê nûjen dike û diparêze. Koçberî jê re nebûye asteng ku dest ji hunera xwe berde. Berovajî wê, hunera xwe diparêze û her dem hewl dide hunera welatê xwe bi pêş bixe. Siyan Nebo ya ji bajarê Efrîna dagirkirî bi stranên dengbêjî yên Efrînê hunera bajarê xwe diparêze. Ciwana bi navê Siyan Nebo di sala 2007'an de ji bajarê Efrînê ji dayîk bû ye. Herwiha Siyan ji heft saliya xwe ve dest bi karê stranbêjiyê kirye. Di derbarê jiyana xwe a hunerî de, hunermeda Kurd a ji bajarê Efrînê Siyan Nebo ji Rojnameya me re axivî.

### 'Min zarokatiya xwe li Efrînê derbas kir'

Siyan Nebo anî ziman ku muzîk ji bo wê jiyan e  û wiha got: "Min zarokatiya xwe li Efrînê derbas kir, zarokatiyeke pir xweş û xwedî xeyal bû. Dema ku 10 salî bûm, êrîşên



dewleta Tirk a dagirker li ser Efrînê dest pê kirin, piştî berxwedana 58 rojan ji neçariyê em koçberî bajarê Şehbayê bûn. Li bajarê Şehbayê em 7 salan man. Di wan salan de me gelek zor û zehmetî kişand, ji ber ku li ser Şehbayê jî gelek êrîş hebûn. Ji neçariyê careke din em koçber bûn, me berê xwe da kantona Cizîrê bajarê Qamişlo."

### 'Bi riya stranbêjiyê mirov dikare hestên xwe parve bike'

Siyan axaftina xwe wiha berdewam kir: "Dema ez li bajarê Efrînê bûm, di temenê 7 salî de tevlî xebatên çand û hunerê bûm, lê min nizanî bû çand û huner çi ye, tenê min digot dengê min xweş e gerek ez tevlî xebatên çand û hunerê bibim. Piştî ku em koçberî bajarê Şehbayê bûn min xwe di warê çand û hunerê de bêhtir bipêş xist. Ji bo ku em li hemberî êrîşên dewleta Tirk serî rakin,  me xebatên xwe yên hunerî bi pêş xistin. Ji ber ku xebatên hunerê jî sekneke mezin dixwaze li hemberî dijmin. Ji ber wê jî em bi hêz in em ê bêhtir hunera xwe bi pêş bixin. Di heman demê de, muzîk û stranbêjî ji bo min jiyan e, ji ber bi riya muzîkê re mirov dikare hestê xwe parve bike. Di heman demê de, bi riya stranbêjiyê mirov hestên ku jiyan dike, derdixe holê.

Min bi taybetî karê hunerî hilbijart ji ber ku min xwe di wir de dît. Armanca min bi hunerê ew e ku em mîrateyên bajarê xwe winda nekin û mayînde bikin. Di xebatên xwe yên çand û hunerê de ez beşdarî gelek mîhrîcan û şahiyan bûme û fêrî gîtar û tembûrê dibim. Dixwazim di pêşerojê de di aliyê hunerê de bêhtir xwe bi pêş bixim û hunerê bi nifşên pêşerojê bidim naskirin. Ez ji her ciwanî re dibêjim bila werin tevlî xebatên hunerê bibin û tiştek ji wan re nebe asteng. Bila gotinên civakê li wan bandorê çênekin em bi hev re bi deng û xebatên xwe hunera xwe biparêzin."

### 'Piştgiriya herî mezin Şoreşa Rojava bû'

Siyan Nebo da zanîn ku malbatê piştgirî dayê ku tevlî qada muzîkê bibe û wiha pê de çû: "Yên ku di destpêkê de piştgiriyê didin malbat û hevalên te ne, lê belê piştgiriya herî mezin Şoreşa Rojava bû ku bi pêşengiya jinan hat lidarxistin û gelek derfetên kar ji jinan re afrand û jin bûn xwedî îrade, dikaribûn maf û hunera xwe biparêzin. Ez jî yek ji wan jinan bûm, bi piştgiriya şoreşê min kar û xebatên hunerê kir û hunera xwe parast. Li Şehbayê gelek zehmetî hatin kişandin ji ber ku em negihîştibûn asta em bikaribin koman ava bikin û xebatên hunerê bi pêş bixin lê tevî wan zehmetiyan me kar û xebatên xwe berdewam dikirin."

Hunermeda Kurd a ji bajarê Efrînê Siyan Nebo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Banga min ew ku her kesê xwedî xewin û xeyal bin, xwe li pêş bixin. Ji bo vê yekê pêwîst e ku asta têkoşîna xwe xurtir bikin."

# 'Hunera şêwekariyê'

Diyala Nîdal\Amûdê

**Şêwekar Serfiraz Hûcê ev çar mehin dest bi karê hunera şêwekariyê kirî ye, herwiha Serfiraz Hûcê diyar kir ku karê hunera şêwekariyê jêhatbûna wî bû.**

Şêwekarê bi navê Serfiraz Hûcê di sala 1996'an de ji bajarê Amûdê ji dayîk bûye. Ev çar mehin dest bi karê şêwekariyê kirî ye. Ji ber hezkirina wî ji karê hunera şêwekariyê re wî, ev kar di jiyana xwe de hilbijart.

Di derbarê kar û xebatên hunera şêwekariyê de, şêwekarê ji bajarê Amûdê Serfiraz Hûcê ji Rojnameya me re axivî.

### 'Ev çar mehin min dest bi karê şêwekariyê kirî ye'

Serfiraz Hûcê anî ziman ku ev çar mehin wî dest bi karê şêwekariyê kirî ye û wiha got: "Karê hunera şêwekariyê jêhatbûna min bû, ji ber ku ez di karê hunera şêwekariyê de pir zîrek im. Dema ez biçûkbûm,



hezkirineke min a mezin ji karê şêwekariyê re hebû. Hin caran li dibistanê min li ser textan xêz dikir û hevalên min bi tevahî, digotin ku ev tiştên ku tu li ser textan hêz dike pir xweşikin. Herwiha malbat piştgirî da min ku ez karê hunera şêwekariyê bikim, di malbatê de xal û apên min şêwekarin. Di heman demê de, peykerên jin û kaweyê Hesinkar bi destê wan hatin çêkirin. Ji ber hezkirina min ji karê hunera şêwerkaiyê re, min ev kar di jiyana xwe de hilbijart"


### 'Karê şêwekariyê ji bo min aramiya can e'

Serfiraz Hûcê axaftina xwe wiha berdewam kir: "Min jêhatbûna xwe ya hunera şêwekariyê di 15 saliya xwe de keşif kir. Lê di wê demê de,




min karê hunera şêwerkariyê nekir, ji ber rewşa min ya xwendinê. Di haman demê de, min xwendina xwe bi dawî kir, hem jî niha ez karê xwe yê hunera şêwerkariyê dikim. Karê hunera şêwekariyê ji bo min aramiya can e, ji ber ku dema ez li ser textan xêz dikim, ez pir kêfxweş dibim. Amûrên şêwekariyê ez bi xwe çêdikim, bê ku ez ji bazirganan bikrim. Ez piranî textê siwêdî bi kar tînim. Her parçeya ku ez çêdikim, ez du rojan li ser kar dikim. Her parçeyek mesrefa wê 15 heta 30 dolarî ye."

Şêwekarê ji bajarê Amûdê Serfiraz Hûcê da zanîn ku ew zêdetir parçeyên ku muzîkê îfade dike, çêdike û wiha bi dawî kir: "Ez alên Kurdistanê jî li ser textan xêz dikim, ji ber ku gelê me zêde alên Kurdistanê dikrin. Herwiha ez gelek hewldanên xwe dikim ku ez di karê xwe de bi pêşbikevim. Di heman demê de, ez ê di meha 10'an de tevlî pêşengiha Desteya Çand û Hunerê bibim. Ez ê di dema pêş de, ji bo xwendekaran perwerdeya hunera şêwekariyê vekim."



## Giraniya gotinê

Remezan Olçen

Em bi wêjeyê û bi hostatiya gotinê dewam bikin. Gelek cure, celebên edebiyatê hene. Di nav me Kurdan de jî weke milletên din ev cure, celeb bi gelek pirtûkên xwe, hene. Lê her pirtûk gelo dibe berhem? Pirs ev e… Em li bersiva wê bi hev re bigerin. Dema em li wêjeya klasîk a Kurdî mêze dikin, jê tam û çêjek digirin ku piraniya xwe helbest e. Sedema vê tam û çêjê çiqas nivîskar û çiqas arezûya me ya li demên berê ye? Tevî êş û janên wê jî çima demên berê bi me xweştir tê. Hukma zemên çiqas li ser vê arezûyê heye? Me di pêşerojê de çi kêm hiştiye ku em di nava wan risteyan de lê digerin? Ez wisa yeqîn dikim, pirsên girîng in? Herçî ehlê qelemê jî wisa bawer dikim ku ji xwe vê pirsê dikin? Yan na heke xemeke xwe tine be çima rabe serê qelema xwe tûj bike?

Îcar li vê derê tişrek din derdikeve pêşiya me; ev pirtûkên ku roj bi roj li pirtûkxaneya Kurdî zêde dibin wê piştî dehê salan çend ji wan li ser bêjingê bimîne. Dema ku ji paşerojê ciwanek rahişt pirtûkeke ji pirtûkxaneya Kurdî wê çiqas li gel bîranîn û çavdêriyên nivîskar li zemanê nivîskar û li civaka ku nivîskar jî ferdek wê ye rast bê. Wê çiqas bikaribe bi wî zemanî re bikeve nav diyalogê û bi rêya wê helbestê, wê çîrok û romanê bibîne bê ka jiyana civakê, xweza, têkiliyên jin û mêr, lîstikên zarokan, lixwekirina cil û bergan çawa û çito bûne?

Weke mînak dema em li helbestên Cegerwîn dinêrin yan jî Fêrik yan jî Mestûrexan û hwd em çi dibînin tevî ku berî dehê salan hatine nivîsandin. Yan jî di nav Dubeytên Baba Tahirê Hemedanî de ku ji hezar sal berê mane tê de em civakeke çawa dibînin. Em li Feqiyê Teyran li Ehmedê Xanî binêrin. Em ê kîjan civakê bibînin. Mesele ev e; bi helbesta xwe bi berhema xwe wan demê jî tehlîl kiriye, wan civaka zemanê xwe jî nîşan daye. Ji ber wê jî îro jî tên xwedin û wisa bawer im wê sibe jî bên xwedin.  Dema wisa dibêjim; bila ev neyê wê maneyê ku vî zemanî helbest, çîrok û romanên wisa tine ne. Hene lê lazim e pir bin, bêhtir bin. Hem ji bo îro lazim in û hem jî ji bo siberojê lazim in.

Ehlê qelemê çiqas hişê xwe kûr bike, bîra xwe paqij bihêle wê evqas bikaribe şahkarên hêja jî biafirîne. Ev karê ehlê qelemê ye. Îcar karê civakê, karê me jî heye. Xwedîkirina vê bîrê û li nivîskarên xwe bûyîna xwedî jî dive karê me be. Ji bo ku nivîs bibe karê nivîskar divê em jê re derfetê çêkin û jê dewa karên baş bikin. Ehmedê Xanî dibêje; Îro herkesek mî'marê dîwarê xwe ye. Madem em dixwazin taq û dîwarê me saxlem be, hingê em dest bidin hev û qedrê giraniya gotinê jî bizanin.

# ‘Bikaranîna zêde ya alavên teknolojî dibe sedema wendakirina nifşên nû’

Di roja me ya îro de alavên teknolojiyê bûne perçeyeke girîng di jiyana mirovan de û di gelek qadan de jî kar hêsan kiriye . Lê bi qasî ku erîniyên wê hene, ewqasî neyînên wê jî hene, bi taybetî li ser zarokan. Lewra ew dibe sedema gelek nexweşiyan yek jê Yekbûyîn (Otîzim) ji bo wê di mijara bikaranîna teknolojiyê û bandora wê ya li ser zarokan, hêmana sereke kontrola dê û bav e.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Bê guman her tişt di jiyana mirovan de aliyekî wê ya baş heya û aliyeke wê ya xerab heye. Pêşketina alavên teknolojî yek jê ye. Mirov nikare înkar bike ku bi saya pêşketina teknolojiya û înternetê ku bersiva hemû pirsên me dide, em dikarin bi nivîsandin û lêgerîna li ser înternetê her tiştê ku meraq dikin, bi dest bixin. Herwiha dikarin bi kesên din re jî parve bikin. Di bin van şert û mercan de, di mijara bandora teknolojiyê ya li ser pêşketina zarokan, weke mijareke girîng ku divê were lêkolîn û derkeve pêş, pêwîst e.

Ji ber ku zarok bi pêşketina teknolojî ji mezinan zûtir pêşdikevin, divê berî her tiştî dayîk û bav, mijolkirina zarokên xwe yên li ser telefona wan yên şexsî, bi baldarî nêz bibin. Lewra tiştên ku tên pêşiya wan, bê ku lêpirsîn bikin, dikarin qebûl bikin. Ji bo parastina zarokan ji gelek nexweşiyên ku telefon dibe sedem wan, divê dê û bav pêlîstok û amûrên li gorî wan bikar bînin. Di vê mijarê de helbijartîbûna dayîk û bavan gelekî girîng û pêwîst e. Çimkî li hember her cure naverokekî ku derkeve pêşiya wan, bê parastin dimînin. Gelek caran ji bo ku dê erkê xwe yê malê biqedîne yan jî ji bo civatan bigerîne, telefonan dixe destên zarokên xwe. Ev yek pir şaşe. Bi taybetî zarokên ku çend heyv kiribin. Ji bo pêşketina mejiyê zarokan gelek çalakî hene ku malbat dikarin bikin. Mîna rûniştina li bexçe û parkan. Pêlîstokên li gorî temenê wan hwd gelek tişt hene.

**Ji bo tedawîkirina kurê xwe pirtûkek nivîsand**

Sara Sîrac Mihemed dayîka du zarokan ne, kurê wê yê mezin yê bi navê Ehmed neh salî ye ew jî yek ji zarokên ku bi nexweşiya (Otîzim) Yekbûyînê ye. Tevî ku Ehmed ji zikmakî ve bi vê nexweşiyê ye lê Sara dayîka wê ji bo nameyekê bighêne dayîkan û neyîna bandora telefonê li ser zarokan, pirtûkek bi zimanê erebî bi navê `Tu Bi Xwe Zaroka Xwe Derman Bike` nivîsand. Herwiha ji bo ku Sara kurê xwe ji vê nexweşiyê rehet bike, tevlî du perwerdeyên rizgarkirina zarokan ji alavên teknolojî bû. Niha Sara Mihemd li navendên bijîşkî li başûrê Kurdistanê zarok û mezinan yê bi nexweşiya yekbûyîn, tevgera zêdê û axaftina dereng perwerde dike. Herwiha hêjaye ku mirov bîne ziman ku Sara li kêlek karê xwe ya perwerdekirina zarokan û erkê wê yê dê, karê xwe yê hezkirina ji wênexêziyê jî, bi salaye berdewam dike.

Sara jî mîna hemû dayîkan dema ku bijîşk jê re got, kurê te bi nexweşiya Yekbûnê ye. Ne dixwest bawer bike. Sara dema kurê wê dibe çend mehî, vê nexweşiyê lê dibîne, lewra ew di dema ku gihiştibû heneke bike, bê deng dima.

**Ew bixwe bû bijîşka kurê xwe**

Sara Sîrac Mihemed ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku wê ji ber nexweşiya kurê xwe nivîsandina pirtûka bi navê `Tu Bi Xwe Zaroka Xwe Derman Bike` hilbijart ta ku ev pirtûk ji dayîkan re bibe alîkar, Sara Mihemed wiha axaftina xwe berdewam kir: “Tevî ku kurê min ne ji ber alavên teknolojyayê bi vê nexweşiyê ket, lê min ji ber tecrûbeya xwe ya şexsî, xwest ku pirtûkê binivîsînim. Naveroka pirtûkê rêbazê danûstandina dê bi zaroka wê ya bi nexweşiya yekbûyîn ye. Ev rê û rêbaz wê bi dê re alîkar be ku li navendên taybet yên vê nexweşiyê negere. Ta ku ew bi xwe bibe bijîşka zarokên xwe. Ev jî ji tecrûbeya min ya ku min bi sala bi kurê xwe re da meşandin, niha ew mîna her zarokekî ye diçe dibistanê û refa sisiya ye.”

Pirtûka Sara ya bi navê `Tu Bi Xwe Zaroka Xwe Derman Bike` li Misir, Kiweyît, Urdin, Qeter belevbûye û nêzîke wê li Îraq û rojavayê Kurdistanê jî were belavkirin.

Sara Mihemed destnîşan kir ku, navendên bijîşkî yên nexweşiya yekbûn rojê sê çalakiyan didin zarokan, wê rojê nêzî 10 çalakiyan dida kurê xwe, lewra di du salan de Ehmed ji vê nexweşiyê rehet bû.

**‘Dan û standina dê û bavan bi zarokan re pir girîng û pêwîst e’**

Sara li ser bandora alavên teknolojî ya li ser zarok û mezina wiha axaftina xwe berdewam kir: “Ti kes nikare vê yekê înkar bike ku bikaranîna zêde ya telefonê, dibe sedema gelek nexweşiyan yek jê ya yekbûne. Nexweşiya yekbûn ya ku ji bandora alavên teknolojiî pêk tê, ji ya zikmakî ve zehmetire. Lewra zarok ji bo bidestxistina telefonê, dikarin her tiştî bikin. Bi dehan şagirtên min yên bi temenê 14 û 25`an hene ku ji ber bikaranîna telefonê gihiştina vê asta ku mîna zarokekî biçûk mirov wan fêrî jiyanê bike. Ne tenê zarok gelek caran ji ber mijolkirina dê û bavan bi telefonê dibe sedema nexweşiyê, lewra danûstandinê bi zarokên xwe yê bi çûk re nakin. Ev yek jî pir şaş û xetere. Temenê ku divê zarok li alavên teknolojî mîna atelefon û tilfizyonê meyze bikin, ji çar salî û bi jor ve ye.”

**‘Ji erkê civakê ye ku bi malbatê re bibe alîkar’**

Sara got, ji aliyê civakê de wê ti alîkarî nedît. Tevî ku di nerîna wê de civak jî xwe berpirsê zarokên bi nexweşiya yekbûnê bibînin. Sara wiha dirêjî da gotina xwe: “Şûna ku civak herwiha dost û hevalên me bi me re alîkar bin,



tersî vê yekê dikirin. Nexweşiya yekbûyîn ne hêsane, rasete mirov ji liv û tevgera wan ya zêde aciz dibe, lê divê mirov jî bi hev re alîkar be. Ez bi xwe heta ku kurê min bi vê nexweşiyê bû, zêde ji malê dernediketim, tenê diçûm malên ku ji kurê min fêm dikin û tehemûl dikirin. Ji bo wê daxwaziya min ji xelkê ew e ku, şûna eciziyê alîkariyê pêşkêş bikin.”

Sara Sîrac Mihemed wiha axaftina xwe bidawî kir: “Banga min ji hemû dayîkan re ew e ku, ji hêza xwe bawer be bi gotinê ti kesî bandor nebe. Lewra ji bilî dê wê ti kes zarokên wê ji nexweşên ku sedema wan pêşketina teknolojiî ye, naparêz e. Divê dê û bav hîn bêtir dema xwe bidin zarokên xwe, lewra dema mezin bibin wê gazina wan ji me be ne ji civakê be. Piranî dê ji ber ku ew ya herî zêde li gel zarokan dimîne.”

# ‘Îsal lêçûna çandiniya pembû pir zêde bû û nirxê kirînê kêm e’

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Cotkarê zeviyê pembû yê bi navê Ebdulkerîm Mihemed diyar kir ku îsal mesrefa çandiniya pembû pir zêde bû û nirxê kirînê kêm bû, ji ber wê cotkaran ziyaneke mezin dîtin.**

Di salên borî de çandiya pembû ji bo cotkarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî girîngiyeke mezin bû, li herêmê qadên fireh ji erdan bi bembû dihat çandin. Lê piştî destpêkirina şerê Sûriyê sal bi sal li herêmê giştî çandiya pembû kêm bû. îsal kêmbarîna baranê û hişkesaliyê bandoreke neyênî li zeviyên bembû kir û berhemê wê zerareke mezin dît.

Di derbarê rewşa pembû û



Ebdulkerîm Mihemed

astengiyên ku derdikevin di milê çandinî û çinînê de cotkarê bi navê Ebdulkerîm Mihemed û karkera bi navê Helîma Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**Nepeydakirina mazotê û kêmbûna karmendan bû asteng**

Cotkar Ebdulkerîm Mihemed da zanîn ku îsal asta berhemdayîna



Helîma Mihemed

zeviyên pembû kêm bû û wiha got: “ Îsal bi giştî asta berhemdayîna pembû gelekî kême û di milê çandiniyê de jî me gelek astengî dîtin. Em mesrefeke zêde li çandiniya pembû datînin, lê berhem kêm tê û mne li gorî mesrefê ye. Îsal ji ber kêm bûna baranê em neçar bûn ku pembû bi ava bîran av bidin, lewma pêwîstiya me bi mazotê hebû û peydakirina mazotê jî ji me re dibû asteng. Di heman demê de karker gelekî kêmbûn, em li tevahî bajar digerin heya ku em çend karkerê çinînê dibînin. Buhayê pembû ku Rêveberiya Xweser diyar kirî gelekî kêm e, di heman demê de mesrefa pembû gelekî heye û berhem kême, ji ber wê cotkar ji çandiya pembû dûr dikevin. Dema berê nav li pembû dikirin zêrê spî, lê van salan bembû ji qedrê xwe ketiye. Hêviya me ew e ku Rêveberiya Xweser destekê bide cotkaran di milê peydakirina mazot, semad û buhayê pembû de.”

**Her tişt bi demê re ji nirxê xwe ketiye**

Karkera bi navê Helîma Mihemed diyar kir ku ew ji Serê Kaniyê ye niha jî li kempa Newroz bi cih dibe û wiha got: “Her sal di demsala havînî de em berê xwe didin nav zeviyan û çinînê dikin û di demsala zivistanê de em di kargeh û xwaringehan de kar dikin. Di van salan de çandinî kêm bûye lewma çi derfet li pêşiya me derdikeve em ji destê xwe nabin. Rojane em ji seat 6 sbehê heya 5 êvarî tên di nav zeviyê pembû de da ku em çinînê bikin. Gerimbûna havînê dibe asteng li pêşiya me lê em neçarin kar bikin da ku em pêdiviyên malbata xwe pêk bînin. Cotkar serê her kêloyek pembû hezar lîreyê Sûrî heqdestê çinînê dide me, raste di dema berê de jî kar bi kêloyên pembû bû lê di wê demê de nirxê pereyên sûrî bilind bû. Hêviya me ew e ku cotkar heqdestê karkerên çinênê zêdetir bikin .”



# Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên dîtbarî

Ji berhemên Ragihandina Azad ku piştî xebatên nivîskî rastiya şoreşê raxistin ber çavan, bûn hêz, rû û dengê gelan; Ronahî TV, Rojava TV û Jin TV.

**Esma Miştefa/Qamişlo**

Di destgirtina vê raporê de em bal kişandiyê ser kenalên televezyonê yên sereke ku bi Şoreşa Rojava re hatine vekirin û roleke girîng di şoreş û ragihandê de lîstine. Ji wan TV’yan kenala şoreşê Ronahî TV, Rojava TV û Jin TV ne.

**Ronahî TV 2012**

Di 21’ê Mijdara 2012’an de Ronahî TV dest bi weşana xwe kir herwiha yekemîn kenalên satelaytê yên navdar e ku bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re hat avakirin.

Têkildarî avabûn, rola Ronahî Tv di şoreşê de herwiha şert û mercên ku tê de hatiye damezrandin û gihîştiya asta heyî, yek ji damezrînerên Kenalê Berfîn Hêzil ji rojnameya me re axivî.

**‘Ez li ser bingeha avakirina ragihandina ku ji bo şoreşê bê avakirin, derbas bûm’**

Berfîn wiha dest bi axaftina xwe kir: “Rojavayê Kurdistanê di dîroka Têkoşîna Azadiyê û şoreşên cîhanê de cihê xwe taybet heye. Rojava rûxmî ku perçeya herî biçûk bû, lê dilê herî mezin ji bo Kurdistanê bû ku her kes di dilê xwe de hembêz dikir. Yek ji wan jî Rêber Apo bû ku di dawiya salên 70’î de derbasî Rojava bû ku xilasî di Rojava de dît. Di destpêka Şoreşê de em derbasî Rojava bûn, di wê demê de hê rengê xeta sêyemîn tam rûneniştibû, hê rêjîma Baas hebû. Ez li ser bingeha avakirina ragihandina ku ji bo şoreşê bê avakirin, derbas bûm. Ji bo min tiştekî nû bû, naskirina min a Kurdistanê nîn bû û him jî cara yekemîn ez li Kurdistanê bi cih dibim bû. Ev ji bo min bû şansek ku gel û welatê xwe ji nêz ve nas bikim. Helbet destpêkê de gelek pirs di serê min de hebûn ji ber ez Rojava nas nakim, lê dema hatim qet ne xerîb bû, ez pir rihet bûm û weke ku ez ji virim bû. Di wê demê de her roj În li Qamişlo meşa Înê a bi navê buhara Ereban çêdibûn, hê navê me derneketibû. Bi van guhartin û pêşveçûnan re û ji ber ragihandin lingê bingehîn yê şoreşê ye, bi awayekî lez diviyabû me ragihandina xwe avakiriba. Êdî me ragihandin ji Heleb û Efrînê anî herêma Cizîrê. Helbet civînên destpêkê hatin lidarxistin ku tê de biryar hat standin wê navenda fermî li Qamişlo be. Wê demê destgehên ragihandinê hemû di zik hev de bûn, lê 2012’an dema me konferans li dar xist birayar hat standin ku her kes cuda bibe. Sîstem, sazsîbûn û bingeha ragihandinê bi fermî ji vir de dest pê kir”.

**Di dîroka Kurdan de Rojavayê Kurdistanê rojnamevanên şer ava kir**

Berfîn di îfadekirina kîliyên destpêkê yên Ronahî Tv de wiha anî ziman: “Wek Ronahî Tv destpêkê de ku em bêjin studio, cihekî taybe an teknîkekî me xurt hebû; Na ev nebûn. Studiyoyekî me di qebûyekî de hebû, her wiha çend kamîreyên me hebûn û bi giştî em 4-5 kes bûn. Di wê demê de Ronahî Tv li Ewropayê hatibû avakirin û diviyabû em li Rojava jî ava bikin. Her wiha ji ber bandora rêjîmê li ser gel, kêliyên destpêkê di nava gel de zehmet bû. Ew perdeya li ser rûyê civakê bi şoreşê re hêdî hêdî rabû. Bi kêliyên destpêkê yên şoreşê re diviyabû em biherikin û bibezin, kengî li kuderê çi çêdibe ne diyare, her tim divê em amede bûna. Bi herikîna şoreşê re derfetên aborî, tecrûbekî mezin û teknîkekî pêşketî di destê me de nîn bû. Profesyonaltiya me a ragihandinê bi şerê Serkaniyê 2013’an re dest pê kir. Cara yekemîn rojnamevanên ku şerê bajaran bişopînin û ferqa rojnamevan û şervanekî nîn be di Şoreşa Rojava de pêş ket. Ya balkêş rûxmî ku tecrûbeyên ciwanên Rojava nîn bû, lê belê gelek bi cesaret, bi daxwaz û tu nêzîkatiyeke wan a madî nîn bû. Bi hêza leşkerî û gel re baweriyek di ragihandinê de ava bû. Dibe ku di warê tewrî de em lawaz bûn, lê di aliyê teknîkî û piratîkî de em pir li pêş bûn. Di dîroka Kurdan de Rojavayê Kurdistanê rojnamevanên şer ava kir”.

**Hebûna Ronahî TV armancên dijmin vala derxist**

Berfîn di çarçoveya rola Ronahî TV li hember şerê çekdarî û Şerê Taybet yên li ser herêmê de wiha got: “Li hember şerên teror, dijmin û destwerdanên ku li xaka Rojava dihatin kirin hêza Ronahê Tv di têkbirina wan şeran de derket holê. Ji ber hebûna Ronahê Tv li her derê, nehêşt ku Şerê Taybet bi ser bikeve. Em dibêjin “Rastî di tarîtiyê de namîne”, Ronahî Tv ew rastî derxist ronahiyê”.



Berfîn Hêzil

**‘Ronahî TV erka xwe li hember şoreşê bi ser bilidî pêk anî’**

Berfîn wiha axaftina xwe bidawî kir: “Artêşa yekemîn a ragihandinê di dîroka Gelê Kurd de li Rojavayê Kurdistanê hat çêkirin. Ronahî Tv erka xwe li hember şoreşê bi ser bilidî pêk anî, em pêjin erka wê bi dawî bûye, na, lê ji dîrokê re tiştên mayînde hêştine, erê. Li gor min heya niha Ronahî Tv pêşeng e. Televesyonên neteweyî yên gelê Kurd avabûn, lê Ronahî Tv hemû netew, ziman, rengên civak û olan di nava xwe de dihewîne. Ger ev misyona xwe ji bîr bike, wê demê xiyanetê li xwe dike. Em di wê baweriyê de ne ku pêwîstiya şoreş û gelan bi Ronahî Tv heye, çawa ku hemû gelên Sûriyê hembêz kir, hîn jî li ser xeta ku hatiye avakirin berdewam dike. Baweriya me heye ku wê hê jî biserbikeve”.

**Rojava TV 19’ê Tîrmeha 2017**

Rojava TV reng û reseniya gelan bi fermî Di 19’ê Tîrmeha sala 2017’an de dest bi weşana xwe kir û bû dengê şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Di Îfadekirina xebatê Rojava Tv de yek ji xebatkarên destpêkê ku xudiyê kedek mezin di aliyê giştî û xweser de Rojnamevan Nûvîn Îsmaîl ku di sala 2016’an tevlî xebatên Rojava Tv bûye, wê demê weke nûçegihan û pêşkêşvan li radyoyê kar dikir. Bi destpêkirina weşana Televizyonê re yekser tevlî xebatên wê bû û weke nûçegihan kar kir. Sala 2020’an derbasî navenda nûçeyan, beşa kurdî dibe û weke edîtor û pêşkêşvana bername û nûçeyan erk digre. Her wiha Nûvîn di sîstema rêvebriyê de jî cihê xwe digre.

Nûvîn di destpêkê de wiha dibêje “Rojava tv ku televisyona fermî ya Rêveberiya Xweser e, beriya ku derbasî weşana xwe ya tv bibe, sala 2014’an weke saziyek ragihandinê girêdayî Rêveberiya Xweser a kantona cizîrê bû, di wê saziyê de beşê radyo bi navê RÊVEBERIYA XWESERIYA DEMOKRAT RXD, û rojnameya rojava, hebû ku heta niha ew rojname tê çapkirin.

Ji ber pêwîstiya herêmê bi televizyonek fermî ku rengîniya civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê parve bike, û weke yek ji destkeftiyên



Nûvîn Îsmaîl

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, ROJAVA TV 19’ê Tîrmeha 2017’an dest bi weşanê kir, destpêka weşan tenê 2 bultenên nûçeyan bi zimanên Kurdî û Erebî hebûn ku di nava wan bultenan de, êşa xelkên herêmê, daxwazên wan her wiha kar û xebatên Rêveberiya Xweser derdixist pêş lewma bi televisyona nêzî civakê dihat naskirin. Li kêlek bultenan jî derdor 4 bernameyên diyalogê û hin dosyayên civakî dihatin weşandin”.

**Bi Rêveberiya Xweser re Rojava tv mezintir bû**

“Rojava tv her sal bi destpêkirina dema weşana nû re xwediguhert da ku li gorî pêwîstiyên qonaxê tevbigere. Piştî rizgarkirina bajarên, Reqa, Tebqa û Kobanê ji çeteyên DAIŞ’ê û avakirina Rêveberiyên Xweser û sivîl li herêmên navborî, êdî pêwîstî bi rêveberiyeke giştî hebû ku bibe sîwanek ji Rêveberiyên Xweser ên herêm û kantonan re, lewma sala 2018’an Rêveberiya Xweseriya demokrat a herêma Bakur û Rojhilatê sûriyê hate avakirin û karê Rojava tv jî bi wê re firehtir bû û derbasî tevahî bajar û kantonên herêmê bû”.

**Rojava Tv bûye zimanê civak û siyasetê**

Nûvîn derbarê xebatê Rojava Tv a heyî de wiha got: “Niha rojava tv televisyonek civakî, çandî û hunerî ye; 4 bultenên nûçeyan bi zimanên Erebî û Kurdî, 48 bernameyên curbecur bi zimanên Erebî, Kurdî, Suryanî û Ermenî, hin bernameyên teybet , dosya, rêzefîlm, belgefîlm û skêtşan jî diweşîne. Di weşana nû ya Rojava tv de ku salane tê guhertin dê formata hin bernameyan were guhertin û zêdeyî 10 bernameyên nû jî dê bikevin weşanê.

Tevî ku Rojava tv bi televisyoneke civakî tê naskirin lê weşana wê bi êşa gelê herêmê re veduhere, her rewşeke taybet, awarte û lezgîn li Kurdistanê çêdibe yekser Rojava tv bernameyên taybet di nava rojê de çêdike, geşedan û bûyeran tîne ser ekrana xwe û li gel rayedar, siyasetmedar û pêkhateyên herêmê nîqaş dike da ku bibe bersiva civakê û agahiyên zelal û durist bi zimanê civakê pêşkêşbike”.



Nîhad Osman

**JIN TV 8’ê Adara 2018**

JIN TV di 8’ê Adara 2018’an de ku di heman demê Roja Jinên Kedkarên Cîhanê ye bi awayek test dest bi weşanê kir û di 30’ê Hezîrana heman salê de ku roja salvegera şehadet û çalakiya fedayî û dîrokî ya Şehîd Zîlan (Zeynep Kinaci) ye, bi fermî dest bi weşana xwe kir. Bernameyên JIN TV bi zimanên Kurdî (Kurmancî, Soranî, Hewramî, Zazakî û hwd.), Erebî, Îngîlîzî û Tirkî tên pêşkeşkirin. JIN TV yekane kanale ku tenê ji aliyê jinan ve tê birêvebirin, tenê denge jinan di hemû waran de bi renge jinan nîşan dide. Jin Tv weke navenda giştî li Holandeyê weşan dike û çar perçeyên Kuridstanê çaxê wê hene.

Yek ji xebatkarên destpêkê a Jin Tv li Rojavayê Kurdistanê Nîhad Osman ji Rojnameya me re axivî û wiha got: “Jin Tv di cîhanê de weke tecrûbeya 2 emîn ku bi dengê jinê weşana xwe dike. Weke navenda giştî ji Holandayê weşana xwe dike û şexên xwe li hemû Kurdistanê hene. Bi avabûnê re li Rojavayê Kurdistanê jî navend hat vekirin û niha navend li bajarê Amûdê ye. Di destpêkê de weke akîb me dest bi perwerdeyên girtî kir, di perwerdeyê de ji hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê cihê xwe tê de digirtin. Piştî ku bingehek hat avakirin kenal li Amûdê hat vekirin. Di 8’ê Adara 2018’an de em ketin weşana test de û di 30’ê Hezîrana heman salê de em ketin weşana fermî. Di wê demê de me bi dosya û raporan dest pê kir, piştî wê hinek bernameyên siyasî, çandî, ekolojîk û sporî hatin pêşkêşkirin”.

Herwiha Nîhad behsa Jin Tv di dema heyî de kir û wiha got: “Di Jin Tv de niha nêzî 30 jinên rojnamevan û xebatkar, kar dikin. Niha ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê 17 bername tên pêşkêşkirin. Hinek ji van bernameyan ku ji destpêka avabûnê de hene û heyanî niha jî berdewam dikin. Jin Tv li Rojavayê Kurdistanê bûye dengê hêz, îrade, êş, serkeftin û hebûna jinan di hemû qadên jiyanê de. Bi jinê re gav bi gav diherike û şoreşa jina Kurd ku pêşengtî ji jinên cîhanê re kiriye, bi rengê jinê belavî hemû cîhanê dike”.

# Ahmed Pelda: Têkiliyeke xurt a civakî û aborî ya Kurdên Ewropayê nîne

**Aborînas û lêkolîner Ahmed Pelda diyar kir ku li Ewropayê ji hemû deverên Kurdistanê bi milyonan Kurd kom bûne, lê têkiliyeke wan ya civakî û aborî ya xurt nîne, tenê çalakiyên siyasî û pîrozbahiyên çandî wan tîne gel hev, lê sazî û dezgehên ku hemû Kurdan bighîne hev, hevkariya siyasî, çandî û aborî xurt bike, nîne.**

**Navenda Nûçeyan**

Derbarê penaberbûna zêde ya gelê Kurd ber bi Ewropayê ve û bandora aborî li ser wan, Aborînas û Lêkolîner Ahmed Pelda bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**- Sedemê bingehîn ên penaberbûna zêde ya gelê Kurd ber bi Ewropa ve çi ne?**

Kurd cara yekemîn ji ber hewcedariyên aborî koçberiya Ewropayê kirin. Bi taybetî di navbera salên 1960 û 80'î de gelek Kurd hatin Ewropayê û wek karker xebitîn. Hinek ji wan vegeriyan, lê piraniya wan li Ewropayê man. Ji xwe di van salan de li Bakurê Kurdistanê koçeberiya bajaran dest pê kir. Di wê demê de hejmareke zêde ya Kurdan çûn bajarên mezin yên Tirkiyê û dest bi kar û xebatan kirin, beşek ji wan jî di bajarên Tirkiyê de bicih bûn. Lê beşek wan li bajarên Tirkiyê memnûn neman û ji wir hatin Ewropayê. Hinek jî raste rast li bajarên Kurdistanê koçî Ewropayê kirin.

Dawiya salên 70'yê koçberiya siyasî, provakasyon û şerê navxweyî dest pê kir. Çepkir û nijadperestan şer kirin. Dîsa li Meraş, Çorum û gelek deveran civaka elewiyên Kurd û çepkir hatin qetilkirin. Li gund û çiyayên Kurdistanê êrişên jendermeyên Tirkan zêde bûn. Bi taybetî dengvedena PKK'ê û gurbûna welatparêziyê metirsiya dewletê zêde kir. Ji bo wê êrişên jendermeyan û zordariya li hember Kurdan her diçû berfireh dibû. Lewma di dawiya salên 70'yê de ji Pazarcix, Elbîstan, Meraş, Dersîm û Sêwasê koça elewiyên Kurd ji bo bajarên Tirkiyê yên mezin û Ewropayê dest pê kir. Girseya Elewiyan li Ewropayê zêde bû.

Bi taybetî darbeya leşkerî ya 1980'î û zordariya li hember civaka Kurd giran bû. Gelek ciwanên Kurdan wek qaçax derketin çiyayan û xwestin xwe ji êrişên leşkeran biparêzin, hinek hatin girtin û hinek jî çûn Ewropayê. Beşeke ji wan jî derbasî Başur û Rojava bûn. Ji vir hinek beşdarî refên Gerîlayên PKK'ê bûn û hinek jî derbasî Ewropayê bûn. Girseya koçberiya Kurdan ya herî mezin di salên 1990'an de dest pê kir. Dewleta Tirk nikarîbû li hember hêzên Gerîlayên ARGK'yê şer bikin. Lewma gundên Kurdan şewitandin. Gelek sivîl qetilkirin û xwestin bi vî awayî têkiliya Gerîlla û gel qut bike. Hin refên civaka Kurd li bajarên Kurdistanê, hinek li metropolên Tirkiyê û hinek jî li Ewropayê bicîh bûn.

Piştî salên 2000 ji bilî Koçberiya Kurdên Bakur yên Başûr û Rojava jî bi awayekî girseyî zêde bû. Şerê li Îraqê piştre şerê Sûriyê ya navxweyî bû sedem ku civak welatê xwe terk bike. Kurdên Başûr û Rojava bêhtir koçî Tirkiye û Ewropayê kirin.

Êdî li Ewropayê ji hemû deverên Kurdistanê bi milyonan Kurd kom bûne. Lê mixabin têkiliyeke wan ya civakî û aborî a xurt nîn e. Kurdên her deverê di nav xwe de mane û bi hev re di nav têkiliyê de ne. Tenê ji ber çalakiyên siyasî an jî pîrozbahiyên çandî wek girse tên ba hevdû. Lê sazî û dezgehên hemû Kurdan bighînîn hev, hevkariya siyasî, çandî û aborî xurt bike nîn e. Hewildanên heyî dûrî hewcedariya nin.

**- Jiyana Ewropa bandoreke çawa li ser Kurdên ku penaber bûne dike di milê aborî de û Kurd li wir bandoreke çawa li ser Ewropa kirine û bandoreke bi çi awayî ava kirine?**

Pirraniya Kurdên li Ewropayê bicih bûn bêyî pîşe, huner û zanist in. Her çiqasî hejmarek xwende, mamoste, endezyar, siyasetmedar, parezger, aborîzan, bijîşk, hunermend û hostayên karên cûrebicûr jî bûne pênaber, hindik in. Herwiha karûbar û zanîna wan li Ewropayê nehate naskirin û qebûlkirin. Lewma ew neçar man wek karker û bazirgan di hin beşên din yên aborî de bixebitin. Pirraniya Kurdan karên ji hêla hostatî, pisporî û zanînê ve hêsa, lê ji hêla destan ve giran dikin. Dikanên doner û restorana vedikin, dikanên pakêt û tiştên ambalaj, vexwarin, sewze û fêkiyan vedikin. Hem jî karûbarê paqijî, avahîsazî, ajotvaniyê dikin. Herwiha barkêşanî, locîstîk û cûreyên bazirganiya cilûbergan jî beşek karên Kurda ye. Ev karûbarê zehmet in. Divê rojane 10 heya 12 saetan bixebitin. Dîsa dikandar ango esnaf nikarin berdela keda karkeran bidin. Lewma bi malbatî alîkariya hev dikin û şev û roj bi karûbarê zehmet re mijûl in. Bi rastî heke heqê karkeran, para sîgorta û ewlehiya wan bi temamî bidin, baca qezencê û para baca lê zêdekirina nirxê jî bidin, nikarin debara xwe bikin û kargehê bimeşînîn. Lewma bi pirranî karê veşartî û derqanûnî dikin. Bi gotina Kurdên Ewropayê karê reş dikin.

Hejmara zêde ya Kurdan karkerên bi dest û millan in. Çi li ba esnaf û dikandarên Kurd bixebitin, çi di kargeh û karxaneyên Ewropiyan de bixebitin, xebatkarê karê zehmet in. Qezenca wan ya mehane jî kêm e. Lewma nikarin debara xwe bikin û alîkariya dewleta sosyal digirin. Bi vê sayê rewşa wan hinekî baş dibe. Lê çi esnaf, çi karker bin hinekê wan jî qaçaxî dixebitin. Ango karûbarê vedizî dimeşînin. Wekî demdirêj bixebitin jî mehaneya xwe hindik nîşan didin. Ji bo kêmasiya fermî temam bikin alîkariyê jî ji dewletê dixwazin. Di nav Kurdan de esnaf û karsazên baca pere qezenc dikin jî hene. Lê ev jî nikarin kargehên rêkûpêk ava bikin ku sazûmanî û pergalsazî rûniştibe. Ji bo vê hewceye ku baca xwe bi temamî bidin, mehaneya karkeran wak standard ango pîvanê Ewropayê bidin, krediya bankeyan bigirin û kargeha xwe ji hêla rêveberî, hilberîneri û sazûmanî ve sererast bikin. Lê ev zanîneke profesyonelî, têkiliyên xurt bi derdorê hêzên aborî ya Ewropayê re dixwaze. Lê pirraniya karker, xebatkar, esnaf, dikandar, karsaz û bazirganên Kurd hê zimanê welatê lê dijî hîn nebûne.

Beramberî kêmasiyên heyî rewşa nifşên nû baştir e. Bi saya pergala Ewropayê ziman hîn dibin, perwerdeya zanîngehan an jî pîşeyê û cûreyên hostatiyên hîn dibin. Bi vê sayê di kargehe û sazgehên mezin yên Ewropî û cîhanî de dixebitin. Yên ku van derfetan jî dest nexin qet nebe, bi saya zanîna ziman û çandî derfetên xwe yên debarê baştir rêve dibin. Tê payîn ku nifşên nû wê ji bo pêşeroja Kurdan bêhtir destekar û alîkar bin. Lê divê neyê jî bîrkirin ku Kurdên Ewropayê li gor pênaberên netewên din, mixabin dîsa kêm xwende ne. ji hêla zanîn, zanîngeh, hînbûna pîşe û hunerê ve lawaz in.

**- Ji bo vegera welat çi kar û xebat tê meşandin û pêwîst e ji bona vê yekê li Ewropa û li hundirê welat çi were kirin?**

Heyanî niha vegera welat ya girseyî û rêxistinkirî di rojeva Kurdên deverê de, nîn e. Piştî bangewaziya Rêber Abdullah Ocalan cara yekem vê niqaşê dest pê kiriye.

Lê diyar e ku ev niqaş û danûstendin, rê û dirbên bi plankirî bîne rojevê. Lê bi awayekî daxwaz û hewldanên vegerê ya civaka Kurd heye. Her gav di rojeva takekes, malbat û koman de ye. Koçberiya siyasî û tengasiyên siyasî êş û kula sirgunê kur û giran dike. Her kî derfetekî peyda bike, gelek rîsk û xetereyan dide berçavan û vedigere nav welat. Hinek li gundê xwe xaniyan çêdikin, hinek li bajarên Kurdistanê xaniyan dikirin, hinek jî mixabin li bajarên Tirkiyê ji



bo sermaye an jî ger û geştê erazî, xanî û havîngehan dikirin. Yên ku vegerin û kargehan vekin jî hene. Lê ew bi gelek tecrûbeyên ne baş re rû bi rû man, lewma ev daxwazî her diçe kêm dibe.

Bi taybetî di salên 2013 û 15'an de dema hevdîtinên bi Rêber Abdullah Ocalan û dewletê hebûn, hêviya gel xurt bû ku wê aştiyê çêbibe, gelek kes vegeriyan Kurdistanê, xwestin li bajar, navçe û gundan kar bikin, kêfxweş bûn û hêvîdar bûn. Lê piştî şer dest pê kir û xeterî mezin bûn, ev şênî dîsa vegeriya Ewropa. Şikestina hêviya gel niha mezin e. Beramberî hewildan û xîreta Rêber Abdullah Ocalan hêviya gel ji dewleta Tirkiyê nîn e. Lewma vê gavê hêviyeke mezin nîn e.

Lê belê her kes jî xwedanê hêvî û daxwaziyên vegerê ye ku heke şert û mercên ewle û xurt hebin. Veguherîneke samîmî ya dewleta Tirk, bi gavên navxweyî yên aramî û aştiyê ve pêkane ye.

Heke Kurdên li Ewropayê bibînîn ku Rêber Abdullah Ocalana gîhîştîye azadiya xwe ya siyasî û fîzîkî, girtî azad bibin, qanûnên astengdar rabin, efûyeke gelemperî pêk bê û Ewropî jî ji vê feydê bibînîn, bi wê newê girseyên mezin wê ji Ewropayê vegerên Kurdistanê. Belê yekser ji Ewropayê naqetin. Da ku zarok û karûbarê wan li vir heye û êdî beramberî hemû kêmasiyan hînî jîyana vir jî bûne. Lê belê him ji hêla hişmendî û siyasî, ji hêla çandî û kulturî, him jî ji hêla hesreta welat bêguman dixwazin lingekî wan jî li Kurdistanê be. Heke ev rewş baş bê rêxistinkirin, girseya Ewropa ya Kurd dikare di navbera hemû perçeyên Kurdistanê û Ewropayê de pireyekê ava bikin. Ev ji hela çandî, pîşeyî, siyasî, dîplomasî û aborî ve wê rêya derfetên mezin veke. Ev kes bi taybetî nifşên nû dikarin têkiliyên civaka Ewropî û yên Kurdistanê jî xurt bikin. Çûn hatina gelan, danûstandinên aborî, çandinî, perwerdeyî, zanistî û hostayî dikare ji gelek têkiliyên xurt û pêşketî re, rê veke.



## Beşera Pêvajoyê!

**Ahmet Aktaş**

Li ser pêvajoya çareseriyê gelek şîrove hene; erênî jî neyînî jî.
Ji ber ku, ne bi tinê çarenûsa doza Kurdistanê, çarenûsa dewleta Tirk jî, bi vê pêvajoyê ve girêdayî ye.
Vê rastiyê hemû sergirdên dewletê; Receb Erdogan, Devlet Bahçeli û yên xwe xwediyê dewletê dibînin hemû dibêjin; "ji bo me, ev pirsgrêka Kurdistanê pirsgrêka Bekaya me ye (ji bo me man û neman e)"!
Di vê derbarê de nivîsakarekî Tirk ê nasyar-navdar Mumtaz'er Turkonu, di van rojên dawî de li pey hev hinek gotarên balkêş, weke rêzenivîsan diweşîne.
Di van gotarên xwe de, bi giranî rastiya cewherê vê pêvajoyê û her wiha rolê Rêber APO dide nîşandan û mirov dikare bêje dîtinên wî, hema hema di çarçoveya şîrovên me de ne. Ka em bala xwe bidin hinek hevokan ji van gotarên wî:
Di gotara xwe ya 29 îlona 2025an a di The Turkish Post de, dibêje:
"Ocalan, yek ji muxetebekî herî maqûl e ku, zemanê kêrhatî pêşkêşî yên di têgihiştina şerdûmercan(pêvajoyê) de tengaviyê dikişîne, ji bo bi destxistina derfetên ku dike ji destê me birevin zemînê xweş dike. Heta mirov dikare bêje (muxetebê) herî giring e. Lewma, ji bo Ocalan, beri hemû sermijarên din ên Pêvajoya Çareseriyê, divê "mafê hêviyê" bi lez were dayîn û demek ji ya din zûtir, ji bo ku Ocalan karibe azad politikayan bi afirîne û bide meşandin, divê şerd û mercên kêrhatî werin amade kirin…"
"Ji bo despêkek nuh, pêşî hewcedariya Kurdan û paşê hewcedariya hemû kesên aştîxwaz, bi gotinên Ocalan, bi kesekî wisa yê azad ê ku rola siyasî hildaye ser milê xwe heye".
"Hûn ji Ocalan hez bikin an nekin, hûn naçar in Wî weke lîderekî xwedî rola polîtîke qebûl bikin"!
Di heman demê de, li ser rola Rêber APO ya berfirehtir gotinên xwe dewam dike û dibêje; "li Sûriyeyê jî kilîta(mifteha) Pêvajoya Çareseriyê di destê Ocalan de ye"…
Bê gûman, cewherî gotara xwe bi giranî li ser têkiliyên Kurdan û Tirkan ava kiriye û dibeje; "jiyana di dîrokê de ne vala ye. Li ber Tirkiyê, ji bilî jiyana çarenûsa(qedera) bi Kurdan re ti rê nîne"!
Di 30 Îlona 2025'an de di (medyascopê) de, dîsa li ser heman mijarê û bi taybetî li ser xebata Komisyona Parlemena Tirkiyê ditînên xwe rêz dike, belê vê carê hinek xemgîinî û rexneyên xwe jî wisa pêşkêş dike:
"Êdî kes nikare xwe ji mijarê dûr bixe, dawî li derfet û bendewariyan hat, heke xêr jî hêzên desthilat dernekeve, hinek kesên din wê bi vî karî rabin.
"Ya desthilat, wê ji ewqas karên pûç dersan derxin û derbasî ser rêya rast a bi hiş û baqil bibin, an jî li Tirkiye desthilatî, bi lez diçe guheztinê".
"Êdî sebra pirsgrêkan nemaye ku xwe li bende hev ragirin û ew di dolabên qeşayê de werin veşartin"!
Yekî weke Mumtaz'er Turkonu, ku ji mêjve bi MHPê û Devlet Bahçeli re ye, ewqas xwe gihandiye rastiya doza gelê Kurdistanê û rola Rêberê wê, êdî hîn pirtir kar û xebat dikeve ser milê Tevgêr û welatparêzên gelê Kurdistanê.
Her wiha li gel asteng û zahmetiyan, rê rohnîtir û derfet jî zêdetir bûne…



# 'Peymana 9'ê Cotmehê plana dewamkirina fermana civaka Êzidî bû'


**Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Cîhan Celo da zanîn ku Cotmeh meha komployan e, peymana Şengalê jî kompoyek bû ji bo temamkirina fermana civaka Êzidî bû û got, "Em encax dikarin bi fikrê Neteweya Demokratîk hemû komployan vala derxin."**

**Navenda Nûçeyan**

Li seranserî Kurdistanê 9'ê Cotmehê rojeke naskirî ye bi komployan, Komploya Navnetewî ya li ser Rêbera Apo, hem jî destpêkirina dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî, dewleta Tirk û komploya peymana li ser Şengalê. 5 sal li ser peymana Şengalê ya ku di 9'ê Cotmeha sala 2020'an de hat destpêkirin, derbas dibin.
Peymana Şengalê yek mîsaqek bû ku ji hêla PDK û dewleta Tirk ve di sala 2020'an de bi armanca radestkirina civaka Êzdî ji komkujî û bêewlehî û fermaneke nû, hate îmzekirin. Ji wê demê heta roja îro bi rêbazên cuda Şengal û Êzdî di bin zextekê de ne, herwiha komplo li ser wan tê meşandin. Derbarê pêkanîna komploya li ser Şengalê hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Cîhan Celo ji rojnameya me re axivî.

**'Cotmeh meha komployan e'**

Cîhan anî ziman ku Cotmeh meha komployan e, lê komploger negihan armancên xwe û wiha domand: "Komploya yekemîn di sala 1998'ya li dijî Rêber Apo hat destpêkirin. Di dîroke gelanda yekî wekî Rêber Apo pir kem car hatiye dîtin. Reber Apo li dijî hêzên desthilatdar ku mafê gel û jinan dixwar û koletî li ser wan ferz dikir, bi fikir û felsefeya azad şerekî mezin da meşandin. Lewma hêzên desthilatdar di pêşengiya Emerîka û NATO'yê de bi kompoyek bêbext û dirû Rêber Apo hedef kirin û girtin.



Komploya dûyemîn jî di 9 Cotmeha sala 2019'an li hemberî Rojava çêbû. Dewleta Tirk û çeteyên wê êrîşî Girê Spî û Serêkaniyê kirin. Esas dixwestin êrîşî hemû Rojava bikin bi giştî Rêveberiya Xweser û Şoreşa Rojava ji hole rakin. Komploya sêyemîn di 9 Cotmehê de di sala 2020 an da di navbera Tirk, Iraq û PDK'ê de li dijî Şengal û Êzdiyan çêbû. Piştî fermanê 2014'an, 9 cotmeha 2020'an de ji wekî tiştek nebûye, bê ku hesabê fermanê 2014'an bidin, Tirk, PDK û Iraq peymana îdareya berî fermanê bi hev re mohr kirin. Meha cotmehê meha komployan e."

**'Encex em dikarin bi Neteweya Demokratîk komployan vala derxin'**

Cîhan Celo tekez kir ku bi felsefeya Neteweya Demokratîk ew ê hemû komployan vala derxin û wiha got: "Di peymana Şengalê de xwestin Şengal careke din bixin bin destê Pêşmerga û dewletê Iraqê de, da ku fermana 2014'an temam bikin. Di 03'ê Tebaxa 2014'an de navbera dewlata Tirk, DAIŞ û PDK'ê de îttîfaq çebû, herwiha Peşmerge xwe ji Şelgalê bi paş ve kişandin. Ji xwe Iraq nikaribû xwe li hemberî DAIŞ biparasta, bajaren wê bê ku li ber xwe bidan diketin destê DAIŞê, ev dewlet wê çawa Ezidî biparasta. Piştî êrîşa DAIŞ'ê li Şengalê felaketek mezin hat serê me Êzdiyan. Eger di kêliya dawî de, Gerîlayên Azadiyê mudaxale nekiriba Êzdiyek jî ji fermanê xelas nedibû û wê qirkirinek mezin bihata serê gelê me. Ango careke din Êzdî bê parastin, îrade behilin da ku carekedin Peşmerge bireve di encamê de jî Êzdî di nav lepê DAIŞê de bimînin. Ji xwe dewlete Iraqê neha jî di xeteriyek mezin de ye, dibe ku her kelî Israîl, Amerîka erişî Haşd Şabî û devleta Iraqê bikin. Yani wek sale 2014 naha jî Iraq nikare ne xwe ne jî Êzdiyan bipareze. Ji xwe em parastina xwe ji kesekî naxwezin. Em dizanin û me ji dîroke ders girtiye, yê ku nikaribe xwe bipareze kes nikare wî bipareze û napareze jî. Peymana 2024'an a navbera PDK, devlete Tirk û Iraq'e de çebû û di encama wê peymane de piştî salvegera fermanê bi çend rojan, bêsedem ji nişkê ve biryara girtina PADÊ(Partiya Azadiya Demokratî ya Êzdiyan) dan. Ev hemû dide nişandan ku ne ferman ne jî komplo hin bi temamî tek neçûye. Em encax dikarin bi fikrê Neteweya Demokratîk hem komployan vala derxin hem ji hêviya yekîtî û itîfaqa gelan ava bikin, xwe û welatê xwe biparêzin."

**'Em ranebin wê dîsa ferman li serê me rabe'**

Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Cîhan Celo diyar kir ku gelê Şengalê ranebe li dijî komployan wê Êzdî rastî fermaneke din werin û wiha qedand: "Her çiqasî di her sê kompoyande zararên mazin gihiştibin gelên me jî, lê bi berxwedana Rêber Apo û gel, ev komplo negihiştin hedefên xwe. Ev dide nîşankirin ku heger em berxwedana xwe li hemberî dijminan mezin bikin dikarin komployan bi tamemî tek bibin, herwiha pêvajoya Aştiyê û Civaka Demokiratîk ku di 27'ê Sibatê de Rêber Abdullah Ocalan da destpêkirin wê bi ser bikeve û komploger û sîstema qirkirinê tune bike. Ji ber vê yekê jî em hemê gelê xweyî bi rumet, hemû ol, gel û mirovên ku li Şengalê dijîn dawetî berxwedanê dikin. Em ranedin carekedin wê ferman serê me rabe. Em rê nedin carekedin koçber bibin, werin kuştin, werin firotin. Em ji dewleta Iraqê re bêjin xwe ji pemanen Tirkîyê bikşîne da ku carekedin ferman neyên serê me. Em ji hemû dewletên cîhanê re dibêjin bêyî azadiya Reber Apo ferman û komplo dawiya wan nayê, ji bo careke din ferman neyê serê civaka me divê azadiya Reber Apo û xweserya Şengalê misoger bibe, hem jî hemû şer bên sekinandin, azadî, aramiya hemû dunyayê pêk were."

# Tayipê li Enqereyê û yê li Emerîkayê!

**Volqan Elî**

Taybetmendiyek e hêzên desthilatdar e, gava li ser erdê ku ew bi hêz û quwet bin, xwe her tişt dihesibîne û bi hemû dirindebûna xwe diçin ser her kesî. Herî zêde jî dagirkeriya Tirk wisa ye û nemaze jî teîfeya Tayip... Niha li Tirkiyê, AKP'ê bi serkêşiya vî kesî şûrê xwe daniye li ser stuyê CHP'ê. Nahêle ev pêkhate nefesekê bistîne. Ew jî qaşo partiya (CHP) M. Kemal e. Lê AKP ti niyeta wê tine ku were rehmê. Herî dawî qeyum ji nava vê partiyê avêt li ser serokatiya Stenbolê werhasil.

Numarayeke din a Tayip jî hezkirina wî ji Erebên Filistînî re ye (!) Lê rastî ne wisa ye. Ew, ji derveyê xwe û berjewendiyên malbata xwe ji tu kesî hez nake! Vê pêvajoyê dawiyê gelek têkiliyên navdewletî çêdibin. Tayip Erdogan diçe kîjan welatên Ereban, xwe wekî dijberê Îsraîl-Emerîkayê nîşan dide. Jixwe dema li Enqereyê ye jî ev helwesta wî her li jor e. Salên derbas bûyî timî digo "ey Emerîka, ey Ewrûpa..." û qaşo gef li wan dixwar. Di van demên dawî de wekî bi Kurdî dibêjin, "ji wî kerî ketiye". Dibe ku ne bi temamî be jî, hinekê wisa lê hatiye. Vê carê Bahçeli siwarê wê kerê ye. Îhtimal e çendek sedemên wê hebin. Lê xuya ye hin ji van li pêş in. Ya destpêkê; dibe ku êdî fêm kiribe ku siyaseta wî ya hamasetê, bê mane û vala ye. Ya duyemîn; hêzên hegemonîk di dîzaynkirina Rojhilata Navîn de (bi taybetî li Sûriyê) rolek dayine wî. Bi rastî jî di vê hevdîtina Tramp û Erdoğan de, balkêş e ku Tramp her digot, "Rewşa li Sûriyê, serkeftina Tirkiyê ye". Jixwe ev di têkiliyên Tirkiyê û HTŞ'ê de pir baş xuya dibe. Heta mirov dikare bêje, ev ne wekî îhtimalekê ye lê rastiyeke li ber çav û şênber e. Mijar ew e ku ev rol bi gelek awayan tê şîrovekirin. Nêrînek dibêje "ji bo ku hemû aliyên neyînî yên HTŞ'ê, ne ku li ser hesabê hêzên hegemonîk werin nivîsîn lê bikevin stuyê Tirkiye ev tê kirin." Sedem çi be jî, niha li ser encama heyî ti kes nîqaş nake: çawa ku Tayip û DAIŞ doh destbirakên hev bûn îro jî Tirkiyê û HTŞ, ku ew jî formeke cuda ya DAIŞ'ê ye, îro li ser erdên Sûrî du destbirakên hev in. Ti hêzên navdewletî û navneteweyî vê înkar nake jî.

Lê derdekî din ê cuda li Tayip peyda bûye! Rewabûna di nava Tirkiyê de... Vê nîqaşê bi qasî ku heyî derdorên muxalîf ên Tikiyê bi germ û gurî dimeşînin. Jixwe Tom Barack jî ev bi aşkere di dema civîna Neteweyên Yekbûyî de, yanî ji beriya ku Tayip û Trump hev bibînin, anî ziman: "Ji Tayip re rewabûn divê". Eger mirov bi xetên stur bîne ziman, naverokek herî girîng a nîqaşa di navbera Tayip û Tramp de jî ev bûye. Nîqaşa rewabûna Tayip yan jî Tirkiyê ev e: Hêzên wekî Emerîka, Îngîlîzîstan û hwd. ji Tayip re wekî bêjin, "em dizanin di nava Tirkiyê de çi dikî, hêzên dijberê xwe çawa tasfiye dikî. Lê em ê ji bo niha îş û karê xwe ji vê neynin. Li hindur çi dikî bike. Çi li CHP dikî, çi li muxalîfan dikî, tu dizanî. Li derve jî me ji te re çarçovey diyar kiriye. Di nav de bimîne, ha ji te re HTŞ, pê re mijûl bibe û perwerde bike!"

Ji ber vê yekê ye ku dema wê civîna Neteweyên Yekbûyî, gava ku Tayip got, "Em tevlî planên aştiya cîhanî ya Emerîkayê dibin. Lê hêza Emerîkayê têrê nake ku hin pirsgirêkan çareser bike." û hwd, wezareta Derve ya Emerîkayê jî li ber pozê Tayip şûşeyê misk û embarê vekir: "gelek welatên wekî Tirkiyê ji bo ku pênc deqqeyan li gel Trump hevdîtin çêbikin, li ber me digerin".

Piştî vê, dema ku kêliyên hevdîtina Trump û Erdoğan dest pê kirin, wî zêde dora axaftinê neda Tayip û bi piranî ew axifî. Tayipê ku li Enqereyê dikir xuraxur û girminî û hesab ji Îsraîl dixwest, li Emerîkayê çi mixabin e ku nikariya bibare. Destê xwe xist berîka xwe û pereyên sê sed balafiran fermoyê Trump kir.

Çend nêrîn hene ku dibêjin Tayip, ji ber wê sedemê dest li berika xwe kiriye; ya yekemîn dibêje, "Ti rewabûn û meşrûbûna Tayip di nava gelên Tirkiyê de nemaye, ev, nirxa kirîna wê ye." Nêrîna duyemîn, "Tayip ji bo ku li ser siyaset bike da ku bêje 'hêza herî mezin a cîhanê Emerîka dostê min e', ji bo ku derfet bibîne siyasetên xwe nîqaş bike yan jî bide qebûlkirin, ev randewûya hevdîtina li gel Trump kirî."

Ji van nêrînan kîjan, çiqas rast dibe bila bibe! Rastiyek heye ku bazirganê herî mezin ê cîhanê ne Tayip e. Qural û qeîdeyên bazirganiyê jî bazirganên herî mezin ew bi xwe çêdikin!

Bi vê rewşa xwe ya dawî, Tayip bazirganekî muflîskar e (kesee zerer kirî); hem ewqas pereyên wî çûn û hem jî heysiyet û avrûya xwe ji dest da!

FENER



## Du sêyên salê ji yekdestariya HTŞ vediguherin bêbawerî û komkujî

**Idrîs Henan**

Piştî ketina rejîma Esad li Sûriyê, îroj zêdetirî du sêyên salê di ser desthilata HTŞ re derbas bidin ku tabloya siyasî, leşkerî û civakî gelek tevilhev bûye û bi heyameke bêzelalî re rûbirû maye ku pêşeroja Sûriyê şîlo û xeternak bûye.
Ev yek jî bi dewamkirina rêbazên şîdet, tund û tûjiyê re bûye şantaj û li derveyî heqîqeta civakê realîze û şikil girtiye.
Bi gotinek din; enerjiya civakê hatiye zindankirin û di şikilê otorîteyeke çors de daye der.
29 Çileya 2024an, Şera – Al Colan – xwe weke serokê Sûriyê yê veguhêz îlan kir û soz da ku aşîtiyê pêk bîne û gelên Sûriyê yek bike. Bi serdanên ji Erebistana Siûdî û Tirkiyê re, ev gava han a xesibkirina îradeya Sûriyê, aliyê herêmî ve hate qebûlkirin. Hemwextî wê jî, bi organîzekirina welatên fena Tirkiyê, Erebistana Siûdî, Qatar û Îmarat ve, aliyê navdewletî ve sozên rakirina sizayan hatin dayîn. Di vî warî de hinek gavên tirsnak ên bi guman hatin avêtin.
Berî dawiya meha Sibata 2025an, bi lez û bez li Qesra Serokatiya Sûriyê li Şamê, Konferansa Diyaloga Neteweyî li dar dixe. Konferansê nûnertiya ti pêkhateyên Sûriyê nekir, tenê kesên li dora desthilatê kom bûne û xwedî berjewendiya istismar û hikumraniyê ne li wê konferansê hazir bûn. Bi konferansê re, zû eşkere dibe ku Şera nekariya pêkhateyên Sûriyê bi cidiyeta projeya xwe ya veguhêz iqna bike û fikarên derdorê zêdetir dibûn. Lê nêzîkatiyên hegemoniyê yên piştgirî didan wê vizyona hişk a navendîbûnê, guman û metirsiyên hene jî zêde kirin ku li şûna Sûriyê ber bi sîstemeke nenavendî ve bibin, teşwîqî sîstemeke navendî dikirin. Ew yek jî di bin navê; rêgirtina li ber şerê navxweyî dikirin. Yanê; qaşo ne sîstemek navendî be, şer û pevçûn nasekine! Zihniyetek wisa ku jorcivakê re xwe dibîne û li gorî wê jî prensîb û regezên exlaqî yên xwezayî yên pêkvejiyanê berovajî dikirin.
Israra di wê nerîna han de, rê da ku 6 Adara 2025an Şera li Beravê li dijî Elewiyan komkujiyan pêk bîne. Hêzên girêdayî dewleta Tirk a dagirker ku di bin sîwana Wezareta Parastinê ya Şera de organîze bûne, li Ceblê, Banyas, Tartos û Laziqiyê komkujî pêk anîn û bi hezaran mirovên sivîl, di nav de jin û zarok jî hatin qetilkirin. Buhane jî ew bû ku; bermahiyên rejîma Esad êrişî hinek xalên leşkerên Wezareta Parastinê ya Şera kirine!
10 Adarê berê xwe dide Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li pêşberî xwe QSD û Rêveberiya Xweser dibîne. Têdigihêje ku wê itîbara desthilatdariya xwe li ser tixûbên wê ji dest bide, qaşo minewre dike û rêkeftina 10 Adarê bi Fermandarê QSD Mazlûm Ebdî re îmze dike. Piştî du rojan, bi şêxê Durziyan El Hecerî re jî li Siwêdayê lihevkirinekê îmze dike. Şera soz dide herdu aliyên navborî ku ew ê pabendê pirrengî û demokrasiyê be. Lê tavilê roja dîtir, 13 Adarê Danezana Destûrî radigihîne û bi sozên weke; em ê pêkhateyên Sûriyê û pirrengiya wê bi destûrê re biparêzin, yekdestariya xwe tekûztir dike. Ji bona wê jî, 5 slan dem dide ku desthilatên xwe firehtir bike. Li gorî wê jî dibe serokwezîr, fermandarê giştî yê artêşê, sêyek endamên meclîsê tayîn dike, misyonên dîplomatîk û endamên Dadgeha Destûrî ya Bilind tayîn dike,…. Hwd. Tîrmehê jî, di derheqê Durziyan de komkujiyan pêk tîne û li hemberî Îsraîlê bi hînceta ku ewlehiya gelên Sûriyê diparêze, gavan paş ve diavêje û sêyek axa Sûriyê radestî wê dike!
Îroj jî du sêyên salê di ser yekdestariya Şera re derbas bidin, li şûna aşîtî, pirrengî û demokrasiyê, çeteyên xwe bi Tirkiyê re li dora Şêx Meqsûd, Eşrefiyê, Bendava Tişrîn û herêmên Bakur û Rohilatî Sûriyê kom dike. Yanê zilam ji sozên hesabprisînê ber komkujiyên nû ve diçe. Li şûna ku guh bide daxawzên demokratîk, berê welêt daye şerekî navxweyî yê nû ku wê qet ji bin dernekeve.